



Ji bo te yê ku dê SFI bixwîne, zimanê swêdî ji bo mihaciran

SFI derseke (kurseke) bingehîn ya zimanê swêdî ye. Armanca SFI ew e ku tu têra xwe swêdî hînbibî da ku tu karibî di civakê de û li cîyê karê xwe çareya serê xwe binêrî. Armanca ew e ku tu her weha karibî xwendina xwe li SVA GRUND, zimanê swêdî weka zimanê dûem di asta bingehî de, berdewam bikî. Di dema xwendina li SFI de, dê derfeta te hebe ku tu bi Rêbera Perwerde û Pîşeyî re hevdiştin pêk bînî. Rêbera Perwerde û Pîşeyî bi te re dibe alîkar da ku tu ji bo karekî pêşerojê perwerdeyek hilbijêrî.

Dibistana- SFI li Tumba

Dem a te miraceatê SFI kir ji te re rendevûyek (wextek) tê dayîn da ku tu bi **pedagogeke ziman** re hevdiştinê pêk bînî. Pedagoqa ziman li derbarê paşeroja te de pirsan ji te dike û testeke ziman ya hêsan çêdike. Ya ku nirxandinê dike ka tu dê kîjin xeta perwerde û kurs bixwînî pedagoqa ziman e.

Li **SFI Swêdê** sê xetên perwerdeyê hene: xeta perwerdeyê 1, 2 û 3. Û çar heb kurs hene: kursa A, B, C û D.

Xeta perwerdeyê 1 bi kursa A, xeta perwerdeyê 2 bi kursa B û xeta perwerdeyê 3 bi kursa C destpê bike. Piştî her kursekê testek çêdikî û notek werdigirî. Ji bo karibî dest bi kurseke nû bikî divê te ji kurseke pêşî not wergirtibe. Em dersên SFI nava rojê, êvaran, rojên şemîyan û ji dûr ve (distanskurs) didin.

Kursa B û C ya SFI bi **kurseke destpêkî** ya ji pênc hefteyan dest pê dike. Li vir ji serî ve dest bi hînbûna zimanê swêdî dibî. Her weha li derbarê dibistanê û kursên cuda yê SFI de agahî didine te. Bi tevî mamoste re pîlanek çêdikin, **pîlana perwerdeyê ya şexsî** ku şiklê xwendina te îzah dike.

Di **kursa C** de derfeta te heye ku xwendina xwe ya li SFI bi **kurseke pîşeyî** ve girê bidî (kombîne bikî). Heger meraq dikî zanibî kîjin kursên pîşeyî Tumba pêşkêş dike, wê demê dikarî bi mamoste yan jî resepsiyona dibistanê re biaxivî. Resepsiyon di qata 3'an de ye.



Li SFI jin û zilamên bi ol (dîn), çand, meyîla seksûelî û paşerojên cuda beşdarî dersan dibin. Em li vir ji her kesî re rêz digirin û miqateyê hevûdû dibin.

Hînbûna zimanekî nû

Li SFI Tumba tu dê di komên mezin û biçûk de perwerde bibî. Hîn caran serbixwe, hîn caran bi tevî kesên din û hem li hundir û hem jî li derveyê dibistanê ders dixwînî.

Li SFI li hundirê sinifê em her tim bi zimanê swêdî diaxivin. Hewl bide heta ji te tê bi zimanê swêdî biaxive.

Mamosteyên li SFI hacetên cuda yê hîndekarîyê bikar tînin. Ev dikarin pirtûkên dersên SFI bin, lê her weha rojname, medyayên civakî, blogg, iPad û kompûter jî.

Li SFI em Google Classroom bikar tînin, ev platformeke hîndekarîyê ya dijîtal ya baş e. Dema dest bi kursa xwe kir tu dê zanyarîyên ketina nav hesabê (inlogningsuppgifter) wergirî

Tu ji perwerda xwe berpirsiyar î

Gelekî girîng e ku tu **di wexta xuyakirî de werî** û bi awayeke aktîf û çalak tevî dersê bibî. Her weha girînge ku tu dersên malê jî çêbikî û tiştên hînbûyî dûbare bikî.

Heger tu nexweş bî yan nikaribî rojekê tevî dersê bibî wê demê **tu bixwe berpirsê** wê dersê yî ku te revandîye. Heger nikarî tevî bibî, mamosteyê xwe agahdar bike. Heger ji ber hîn probleman nikarî tevî SFI bibî, wê demê tu û mamosteyê te dikarin bi hev re alternatîfeke baştir ji bo perwerda te peyda bikin.

Tu bi tempoya xwe perwerde dibî

Em her pênc heftayan carekê şagirdên nû qebûl dikin. Ji ber vê yekê şagirdên me di tarîxên cuda de dest bi xwendinê dikin û xwendin bidawî dikin. Dema te hedefan bicîh anî kurs bidawî dikî. Ji bo kesên cuda dirêjayîya wexta dawîkirinê jî cuda ye. Ji bo her şagirdî wexteke azamî dirêj ya dibistanê heye û ev jî girêdayî wê xeta perwerdeyê ye ya ku te hîlbijartî ye. Heger mamoste wê nirxandinê bike ku metirsî heye ku tu dê nikaribî kursê di dema hatîye xuyakirin de bidawî bikî, wê demê hewldanên alîkarîyê dikevîne dewrê.

Di dawîya kursê de tu Îmtîhaneke Netewî (Nationellt prov, NP) pêk tînî. Û mamosteyê te biryarê dide ka tu kengî amadeyê pêkanîna vê îmtîhanê yî. Dema kursa te bidawî bû notek (qarneyek) werdigirî.

Girîng e tu zanibî ku hînbûna zimanekî nû wext dixwaze.



Jibîr neke:

- Tu nikarî zarokên xwe bi xwe re bibî dibistanê.
- Heger neçî dersên SFI wê demê weke "nehatî" têyî qeydkirin. Nabe ku tu zêdetirî 21 rojan neçî dersê. Heger tu nexweş bî yan jî biçî tatîlê (semester) dibistan ji vê yekê haydar bike.
- Hîle û zexelîya di îmtîhanên SFI de bi tundî qedexe ye.
- Ji ber alerjîyan, tu nikarî li dibistanê gelekî parfum bikarbînî.
- Tu dikarî tenê li cîhên xuyakirî yên li derveyê dibistanê cîgare bikşînî.
- Heger alarma şewatê lê bide divê tu bi awayeke lez xwe bigihînî derîyê revê (nödutgâng) û biçî wê medana parka mezin ya li derveyê SFIyê. Hemû tiştên aîdê te li hundir bihêle.

Fermo, dest bi perwerda salmezinan SFI ya li şaredarîya Botkyrka bike!